# Rapora Heyva Sor a Kurd li ser êrîşên dewleta Turkiyê û ziyanên wê li herêmên Bakur û Rojhilatê Suriyê – Cotmeha 2024

Di şeva 23ê Cotmeha 2024an de, Tirkiyê dîsa dest bi êrişên mezin li ser Bakur û Rojhilatê Sûriyê û bakurê Iraqê kir. Li gorî Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê, di encama van êrîşan de di navbera 4 rojan de 17 kes li bakurê rojhilatê Sûriyê, 6 kes li Şengalê jiyana xwe ji dest dan û 65 kes birîndar bûn (zarok jî di nav de). Van êrîşan bi giranî binesaziya sivîlan kirin hedef, heman dîmena êrîşên Tirkiyeyê yên payîza 2023'an dubare kirin, ku zirarên mezin û bandorên giran li ser gel kir, û dê bandorên demdirêj li ser ewlehî û aramiya herêmê bike.



Stasyoneke petrolê li Dêrik (wêne ji ofîsa ragihandina Heyva Sor a Kurd )

Tîmên rewşên awarte û lezgîn ên girêdayî Heyva Sor a Kurd 46 kesên ku bi giranî birîndar bûn rakirin nexweşxaneyan ku piraniya wan ji Qamişlo û Kobanê ne.

Her du klînîkên tenduristiyê jî yên li Qamişlo ku girêdayî rêjîma Suriyê ne û vaksînên zarokan pêşkêş dikin, xizmetên xwe bi awayekê demikî rawestandin, sedema wê jî êrîşên hewayî yên nêz bûn. Lê di dema nivsandina vê raporê de ji nû ve hatine vekirin.



Kilînkek li Qamişlo ziyanin biçûk bi sedema êrîşin nêz dît (wêne ji ofîsa ragihandina Heyva Sor a Kurd)

Êrîşên li ser stasyonên sereke yên elektrîkê li Kobanî, Amûdê, Qamişlo û Tirbespiyê zêdetirî 150 hezar malbat û 366 gund ji av û elektrîkê bêpar hiştin.

Mîna sala 2023'an, êrîşên dewleta Tirk dîsa li herêmê çavkaniyên xwarinê û xizmetên girêdayî wê kirin hedef. Li Eyn Îsayê mîra  genim hat bombekirin. Li Kobaniyê û Amûdê jî nanpêjxane rastî êrîşan hatin û ji xizmetê derketin.





Stasyonên eletriîkê li Qamişlo û Tirbespiyê  (wêne ji ofîsa ragihandina Heyva Sor a Kurd)

Stasyonên neft û gazê yên li Dêrikê, Swêdîkê , Tirbespiyê û Gir Zero bûn hedef û hatin îmhakirin. Heman cih ji dema êrîşên dawî yên Tirkiyê di sala 2023an tenê beşek jê hatibû sererastkirin .ku wek çavkaniyên sereke yên sotemeniyê yên ji bo cenetorên ava vexwarinê û nanpêjên herêmên bûn û di encama van êrîşan de zêdetirî 600 bîrên avê yên li herêmê ji xizmetê derketin.



Stasyona Gir zîro ya Niftê (wêne ji ofîsa ragihandina Heyva Sor a Kurd)



Stasyona Siwêdiyê ya Niftê (wêne ji ofîsa ragihandina Heyva Sor a Kurd)

Li Tirbespiyê qadeke petrolê û 2 parzûngeh hatin hedefgirtin û îmhakirin




Stasyona Siwêdiyê ya Niftê (wêne ji ofîsa ragihandina Heyva Sor a Kurd)

Li Rimêlanê, kompaniyeke avahîsaziyê, qadeke neftê , navendek hilberîna oksîjena bijîşkî, û nanpêjxane, û navendên din ên xizmetguzariyê yên giştî û taybet hatin hedef girtin..



Nanêja Dêrakê



Depwa genim û elef ya Qamişlo (wêne ji ofîsa ragihandina Heyva Sor a Kurd)

Li Qamişlo navenda genim û li Dêrikê kargeh penêr hatin hedefkirin û xerakirin



li Dêrikê kargeha penêr(wêne ji ofîsa ragihandina Heyva Sor a Kurd)

**Her wiha kargehek plastîk, kargehek dirûtinê, garaja erebeyan,ciheke tamîr kirina erebeyan , kargehek çîmentoyê û navendek çandiniyê jî kirin hedef.**

**Tirkiyeyê êrîşî hêzên ewlekariya hundirîn kir ku girtîgeheke çeteyên DAIŞ'ê diparêzin, avahî hat xirakirin û hewldana reveke hêsan kir. Di dema amadekirina vê raporê de, rewş di bin kontrolê de ye, lê ew amadekariyên Tirkiyê ji bo bihêzkirina DAIŞê ji bo pêkanîna armanca xwe ya bêîstiqrarkirina navçeyê nîşan dide.**

**Êrîşên Tirkiyê rasterast xelkê sivîl li Bakur û Rojhilatê Sûriyê dike armanc û çavkaniyên sereke yên xwarin, av û enerjiyê li herêmê wêran dike. Binesaziya ji santralên elektrîkê, xwarin û dabînkirina avê, û mazotê hîna ji zirarên ku di êrişên 2023-an de mayî xelas nebûne, astên van çavkaniyan naha pir kêm in, ku bandorê li jiyana rojane û karûbarê gelemperî yên wekî ambûlansan dike. Di demekê de ku Rêveberiya Xweser bi hezaran penaberên yên ku ji pevçûnên li Lubnanê direvin, dihewîne.**

**Li Bakur û Rojhilatê Sûriyê jî di demek nêz de dê pileya germê kêm bibe. Herêm xwe dispêre mazotê wekî çavkaniya sereke ya germkirinê. Bi nêzîkbûna zivistanê re, ji aliyê Tirkiyê ve bi mebesta hedefgirtina sotemenî, xwarin û avê, niştecihên herêmê dixe bin xetera birçîbûn, serma û nexweşiyê.**

**Êrîşên Tirkiyê yên li ser binesaziya sivîl pêşketinên di warê aramkirina Bakur û Rojhilatê Sûriyê de têk dibe. Qutkirina pêdiviyên jiyanî şert û mercên jiyanê xerab dike, zexta li ser gel zêde dike ku ji herêmê derkevin. Ev yek di demekê de ye ku Tirkiye penaberên sûrî îstismar dike da ku piştgiriya aborî û siyasî ji Ewropayê werbigire.**

**Ofîsa ragihandina Heyva Sor a Kurd**